

Êrîşên Li Arasteyî Koçberan Re Dawîn Lê Bidin!

Abdûllah Gurlek û Vedat Yeler Serbest Berdin!

Dewleta Yewnan di pêvajoya dawî de bi hikûmeta Partiya Demokrasiya Nû ya rastgir ve êrîşên xwe yên ku li arasteyî koçberan zêde kiriye. Dewleta Yewnan di meclîsê de li arasteyî koçber û penaberan qanûnên paşverû derbas kir û hema li piştî vê bi operasyonên polisan ve koçber û penaberan ji cîhê wana, ji "malên dagirî" vala kirin e û jiyanên mîrovan dijwarê bajarên konteyner ên pir zêde nebijûnder kirin e.

Ji ev polîtîkayên dewleta Yewnan şoreşgerên Tirkiyê û Kurdîstanê ên nasnameyê wanên polîtîk vekirî ku penahê Yewnanîstanê kirine jî para xwe hildidin. Ev pêkûti û êrîş gereka bi êrîşên li dijî koçberan ve were dest hildin. Di çapemeniyê de nûçeyên, li arasteyî penaberan bi sedema pêwîstê "dereqanûn derbas bûna" sînorê Tirkiyê - Yewnanîstanê de sepandinê tundî, îşkence û paş lê vegeandinê Tirkiyê cîh hildide. Dîsa koçber di wargehên civandinê ku mercên deremîrovî de tîn girtin û ji vir nûçeyên tacîz kirina jin û zarokan jî tînen. Ev kesên nasnameyê wanên polîtîk vekirî û ji ber pêkûti, girtin û îşkenceyên dewleta Tirk a faşîst, Tirkiyê terikandînin û derbasê Yewnanîstanê dibin ji aliyê polîsên Yewnan piştî binçav kirinê; polîsên Yewnan li dijî qanûnê xwe tevger dike û ev kesên polîtîk bi awayek beqanûn paş lê vegeandinê Tirkiyê dike. Ev rewş di rejevê de ye. Ev koçberên polîtîk piştî paş lê vegeandinê ji aliyê hêzên Komara Tirk ve dûçarî pêkûti û îşkenceyan dimînin; bi cezayên hepsê ên salên dirêj ve tînen gefandin.

Ji aliyek din ve bi taybetî di çapemeniyê de li Merîç û Deryaya Egê de bi awayek bêqanûn koçberan "paş tehn dana" Tirkiyê, cîh hildide. Tê daxuyandin; polîsên Yewnan yên bi rupeşkirî an jî kesên bi rupeşkirî û nîşankên uniformayên wan nexûya li xwe kirine li koçberan û penaberan îşkence dikin, berî pêşiyê dest didin ser pere, nasname û tîkberên wanên şexsî hetta dest didin ser kinc û solên wan û wana bi binkincên wan ve paş lê vegeandinê Tirkiyê dikin.

Di sînorê Yewnan de li dijî ev êrîşên biserûber û deremîrovahî ên polîs û çeteyan, mîrovên ku alîkariyê malbat û hevalên xwe dikin vê carê jî aliyê dewleta Yewnan ve tê sîncdar kirin û bi cezayên hepsê ên salên dirêj ve tînen gefandin. Şoreşgerên nasnameyê wanên polîtîk vekirî jî bi van sîncên sexte ve tînen girtin. Ji ev êrîşan de mînaka dawî jî bi girtina Abdûllah Gurlek û Vedat Yeler ve hate jiyandin. Nasnameyên ev her du şoreşgerên polîtîk vekirî ye. Abdûllah Gurlek û Vedat Yeler bi sîncê "qaçaxciyê mîrovan" ve hatine sîncdar kirin û di Girtîgeha Komîtîne de girtî ne. Gurlek û Yeler, niha girtî ne û di nav vê qewlê de derneketine pêşiya dadger. Di meha Tîrmehê de dîroka danîşîna ku ji bo dadgehê dabûn Gurlek û Yeler û ev dîrok bê dadgeh paş ve hate avêtinê 20ê meha Rêbendanê sala 2020an. Girtî bûn û heta niha derneketina dadgehê ji bo her du şoreşgerên nasnameyê wanên polîtîk vekirî re rewşek neqebûl kirine.

Dewleta Yewnan û hikûmeta Demokrasiya Nû derhal dawî lê ev polîtîkayên xwe yê ku li arasteyî koçberan, şoreşgerên Tirkiyê û Kurdîstanê dide sepandin bîne; ji polîtîkayên ku bi tundî, îşkence û paş lê vegeandin tînen sepandinê dest jê berde. Ji girtî bûna şoreşgerên nasnameyê wanên polîtîk vekirî re dawî bidin û derhal wana serbest berdin.

Ji Polîtîkayên Li Koçberan Tînen Sepandin Re Dawî Bidin!

Paş Lê Vegerandinê Bêqanûn Bidin Sekinandin!

Ji Girtiyên Polîtîk Gişt Re Azadî!

Bijî Piştgiriya Şoreşger!

Platforma Yewnanîstan Ya Yekîtiya Çalakî Tirkiye/Kurdîstan

Berfanbar 2019